Serokê Dezgeha Roşenbîrî ya Êzidiyan li Holanda:

Dûrbûna Êzidiyan Ji Hev Metirsiyekê Di Êxe Ser Nasnama Wan

Di van salên dumahî de çendîn komelên Êzidiyan yên roşenbîrî li Europa hatin damezrandin ku vekolîn û
bizavên xurt dikin, ji bo vejandina rê û rism û rewşt û tîtal û dîroka Êzidiyan û nasmana Êzidiyatiyê wek dînekî rewanî kevn û dêrîn li cihanê û hewldan ji bo bi destve înana danpêdanê wek dînekî fermî li rojhilata navîn. Û ji wan komelan Dezgehê Êzidiyan yê roşenbîrî li Holanda. Me jî ev hevpeyvîne li gel berêz şêx Silêman şêx Hesen, serokê wê kir, daku em ronahiyekê bidin ser rewş û xebata vî dezgehî:- *Gelo destpêka avakirina vî dezgehî çilo bû?*

B: Helbet piştî jimareke baş ji Êzidiyan li welatê Holanda kombûn, pêtvî hate dîtin ku bingehek ji civîn û kombûnên wan re bête peydakirin ji sedema jiyana wan di nava vê şaristaniya Europî de, herwisa jiyana xelkê me û akincîbûna wan di bajarên ji hev dûr metirsiyek êxiste ser windakirina nasnama Êzidiyan ya dînî û netewî. Lewra li sala 1996 peywendî bi me hate kirin ji aliyê (Bingeha Êzidiyan li dervey welat "EZiA") û em bûn wek şaxek ji vê bingehê li Holanda û me li ser wî esasî xebatkir, heta sala 1998 ku li dûv destûra Holandî diviya em wek komelek serbixwe karbikin û ne girêdayî bingeheke dervey Holanda bin. Li roja 25.10.1998 li bajarê Almêra komeke roşenbîr, rîspî û ciwanên Êzidiyan kombûn û bingehê Êzidiyan yê roşenbîrî û komelayetî hate damezrandin lê li pê yasa Holandî moletkarî bi navê (Dezgehê Êzidiyan yê Roşenbîrî) ji me re hate rewanekirin.

P: Ji kerema xwe hûn dikarin, armancên dezgehî bidin rû?

B: Me komeke armancan dabû pêş çavên xwe weke; Mukumkirina peywendiyan di nav Êzidiyan de, ji her welatekî, bizav ji bo parastina kultûrê dînî û pêşvebirina roşenbîriya Êzidiyan, avakirina peywendiyan li gel bitirya komel û layenên dînî û civakî û dezgehên mîrî û institût û zanîngehan, komkirin û belakirina kelepûrê dînî yê devkî, perwerdekirina zarokan, weşandina govara Çira û gêrana semînaran, herwisa berevanî bi mafê penaberên Êzidî.

P: Başe heya niha we çi xebat kiriye?

B: Bi rastî li gor pêkarînên xwe me dirêvî nekiriye, me cejn bo nimûne bi kor û ahengan pîroz kirine, govara Çira jî (j. 1) li bin çapê ye û wê di demeke nêzîk de bi 3 zimana (Kurdî, Erebî û Holandî) derkeve, dîsan jî me sera dam û dezgehên fermî li ser astekî bilind kiriye, weke parlamatê Holandî û beşdarbûn di konfiransê mafê mirovan li Kurdistanê, yê li parlamant de hatî sazkirin, rewanekirina namekê li ser rewşa Êzidiyan bo wezareta dad û rêkxistina lêborîna navnetewî. Dîsa çareserkirina gelek arîştan di nav Êzidiyan de û başkirina rewşa penaberan, bi taybetî di mesela dûrkirna wan ji Holanda. Me li bere di ayindekî nêzîk de fêrgeha dînî vekîn û çendîn pirojên din bi hevkarî li gel pilatforma Kurda li Holanda.

Li dumahiya hevdîtina me de hêja şêx Silêman got: "Ez zor supasiya we bo vê dîdarê dikim, bi rastî em pir kêfxweş û şad bûn bi derkeftina yekemîn rojnama Êzidiyan. Miraz û daxwazên me Qendîl her bimîne qendîleke geş û ronahiyê bide rêya ciwan û genc û roşenbîrên miletê me.

Rîportaj: Heso Hirmî